Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :971 | 15-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## Ji sedî 14'ê nifûsa cîhanê bi nexweşiya Lymeyê ketiye



**Li gorî lêkolîneke hatî kirin, zêdeyî ji sedî 14'ê nifûsa cîhanê bi nexweşiya Lymeyê ketiye.**

Nexweşiya Lymeyê di encama enfeksiyona ji yek curên çar bakteriyên sereke ku bi rêya keneyan tên girtin, çêdibe.
Nexweşiya Lymeyê ku çavkaniya xwe ji bakteriya Borrelîa Burgdorferiyê digire, kêm caran dibe sedema mirinê. Di kesên ku ji aliyê qijniyek a bi nexweşiyekê ketî ve tên gezkirin de piranî sorahî çê dibe, şaneyên mîna şewbê yên weke êşa masûlke û movik, êşa ser, lêdana mehd û vereşîn tên dîtin.
Ji ber ku qijniyên bakteriyan hildigirin zêde bûne, rîska ketina vê nexweşiyê ji bo kesên li cihên çêre û bi daristan dijîn zêdetir e.
Li gorî lêkolîna di kovara BMJ Global Health de hat weşandin, Ewropaya Navîn xwedî rêjeya sedî 20 û rêjeya herî bilind e.
Mirovên li ser temenê 50 saliyê yên li cih û warên bej dijîn, di bin xeteriyek a zêdetir de ne.
Lêkolîneran ji 4 hezar û 196 lêkolînan 137 lêkonînên guncaw diyar kirin û ji van daneyên 89'an anîn dan ber hev.
Bi giştî nêzî 160 hezar beşdar, di xwîna wan de ji sedî 14.5 antîkorên li dijî bakteriya Borrelîa burgdorferî (Bb) hat dîtin.
Li gorî lêkolînerên ku gihîştin encama ku zêdeyî ji sedî 14'ê nifûsa cîhanê bi nexweşiya Lymeyê ketiye, piştî Ewropaya Navîn herêmên ku nirxa antîkorê lê zêde bi 15,9 Rojhilatê Asya, bi 13,5 Rojavayê Ewropa 3 û bi 10,4 Rojhilatê Ewropayê. Reşahî jî bi herêma herî kêm ji sedî 2 antîkor hildigire balê dikêşîne.
Lêkolîner radigihînin ku ev zêdehî ji ber sedema guherîna demsalan, koça ajalan û kirina destên xwe bi ajalên kedî, havînan dirêjtir diajo.
***ANF***

## Li Dêrazorê çewlikeke mirîşkan hat vekirin



**Yekîtiya Bijîşkên Beyterî li gundewarê Dêrazorê ji bo desteka xwediyên mirîşkan û pêşxistina rêgeza xwexwedîkirinê, çewlikeke mirîşkan vekir.**

Ji ber zehmetiyên peydakirina êm û dermanan û buhabûna bihabûna sotemeniyê, li gundewarên Dêrazorê xwedîkirina mirîşkan kêm bûye û gelek kes dest ji vî karî berdidin. Ji ber vê yekê, Yekitiya Bijîşkên Beyterî ya gundewarên Dêrazorê, çewlikeke mirîşkan vekir. Serokê Yekitiya Bijîşkên Beyterî Ebdullah El-Hemed bal kişand ser girîngiya xwedîkirina mirîşkan û desteka ji bo xwediyên wan û got: "Ev çewlik dê bibe sedema pêşxistina xwedîkirina mirîşkan li herêmê."
Di çewlikê de 2 dayîngeh hene û her yek dikare 57 hezar û 600 hêkan bigire nava xwe. 21 rojan carekê 19 hezar û 200 hêk derbasî wan dayîngehan têne kirin.
El-Hemed got: "Ev amûr li herêmê yên herî baş in, di aliyê kalîtiyê de li ser asta Sûriyê yekem e."
Li gor serokê Yekitiya Bijîşkên Beyterî, dê ji sedî 35 barê lêçûna anîna çîçikan ji bo xwediyên mirîşkan kêm bike.
Li gundewarên rojavayê Dêrazorê derdora 160 kargehên mirîşkan hene.
***ANHA***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Amade** | **Çêkirî, sazkirî, durist, hazir: Xwarin amade ye. Ez di civînê de amade bûm.** |
| **Civak** | Komek mirov ya bi hev re li welatekî, yan bajarekî, yan gundekî dijî û xwediya hin taybetiyên hevbeş: Gelê Kurd civakeke kevnar e. |
| **Çand** | Urf û adetên di nava demê de ji civakekê re bûyîn exlaq. Tore, kelepûr, kultûr: Di çanda Kurdan de mêvanperwerî pir xurt e. |
| **Derfet** | Delîve, fersend, kes, mecal, imkan... Derfet çênebû bixwînim. |
| **Desthilat/desthilatdar** | Kes, yan jî kesên hêza siyasî, yan leşkerî, ya welatekî yan herêmekê di dest de. Rayedar, karbidest, serdar, serdest: Li Kurdistanê biyanî desthilatdar in. |
| **Navend** | 1.Nîvê derekê, cihê girîng: Ez çûm dikaneke li navenda bajêr. 2. Bingeh, ciyê agahî lê kom dibin û jê belav dibin: Ez çûm navenda saziyê. |
| **Pêwîst** | Tişta pêdivî pê heyî, divê. Ji bo yekîtiyê pêwîst e em tiştekê bikin. |
| **Saye** | Bi saya wî ez baş bûm. Bi xêra wî, dewlet serê wî. Di farisî de jî bi heman wateyê heye. Tirk jî bi kar tînin. |
| **Şano** | Zarvekirin, berhema tiyatroyê, berhema zarvekirinê ya lîstikvan pêşkêş dikin. |
| **Şoreş** | 1.Avêtina hikumetê ji desthilatdariyê. 2.Têkoşîna dûrxistina hikumetê ji desthilatdariyê. 3.Guhertinên bingehî. 4.Peydabûna tişkeke berê nedîtî. |

## Ewropa dibe ku heta sala 2050'yî di enerjiyê de têra xwe bike



Enstîtuya Teknolojiyê ya Federal ya Swîsre (EPFZ) ya li Zurîhê diyar kir ku Ewropa di serî de petrol û gaz û sotemeniyên fosîl zêdeyî nîvê enerjiya xwe ji der ve distîne.

Di lêkolîneke di kovara Jouleyê de îşaret bi wê yekê hat kirin ku bi enerjiya tê nûkirin û Ewropa xwedî gelek derfetan e ku pêdiviyên xwe pêşwazî bikin. Bi lêkolînê destnîşan tê kirin ku Ewropa heta bi sala 2050'yî di warê enerjiyê de têra xwe derfetên xwe hene. Koma Bryn Pickerina a li EPFZ'ê, bo nimûne; bi sotemeniyên biyo, depokirina elektrîkê di plan de ya jî elektrîkkirina çavkaniya germahiyê û trafîkê bi tevahî 441 bijareyên bên bipêşdebirin hatin diyarkirin.
Fikira bi hevparî ew e ku beriya her tiştî di serî de ba û roj li ser berferehkirina bi awayekî mezin û zêdekirina alternatîfên enerjiya tê nûkirin tê rawestin. Li gor lêkolînê dibe ku mirov teknolojiyên cur bi cur ên wek veguherîn, depokirin û belavkirinê jî lê zêde bike.
Her wiha lêkolîneran, bi varyasyonên pêşkêş û daxwazê ji bo 35 welatan ji bo dîmenbarkirina vê rewşê navgîneke kompîturê bi pêş de birine.
Ev navgîn, di serî de yên biryarên siyasî didin ji bo xwegihandina bêpere hat pêşkêşkirin.
***ANF***

## 'Hêza' cara 4'an bû belgefilma herî baş




**Belgefilma derhêner Derya Deniz "Hêza" li Festîvala Filman ya Navneteweyî ya "Film in Focus" ya 4'an hêjayî xelatê hat dîtin.**

Belgefilma derhêner Derya Denîz "Hêza" li Festîvala Filman a Navneteweyî ya "Film in Focus" a 4'an hêjayî xelatê hate dîtin.
Belgefilma Hêza, beriya niha li Festîvala Filman a Navneteweyî ya Boden a Swêdê xelata belgefilma herî baş, li Festîvala Filman a Navneteweyî ya Drûkê ku li Bhûtan a li Başûrê Asyayê, xelata serketinê, li Festîvala Xelatên Filman a Jinê ya Serbixwe ya Los Angelesê jî xelata belgefilma herî baş wergirtibû.
Bi xelata li Festîvala "Film in Focus" re Hêza xelata 4'an a belgefilma herî baş digire.
Derhêner Derya Denîz got, ew van xelatan hemûyan diyarî gelê Kurd, Êzîdiyan û bi taybetî jî jinên Şengalê dike yên ku di rojên zor û zehmet de her tim li ber xwe didin.
Belgefilma Hêza wê Tîrmeh û Tebaxê jî li Îtalya, Portekîz, Elmanya, Îsraîl, DYE û Ingilistanê li festîvalên navneteweyî bê nîşandan.
***Ozgûr Polîtîka***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | E | D | ■ | Z | E | N | D | ■ |
| 2 | A | D | ■ | S | A | W | ■ | E | M |
| 3 | F | E | R | ■ | X | ■ | A | L | Î |
| 4 | ■ | N | A | T | O | R | ■ | T | ■ |
| 5 | X | E | ■ | Û | ■ | E | B | A | D |
| 6 | W | ■ | A | L | A | ■ | O | ■ | O |
| 7 | ■ | A | ■ | E | L | E | Z | Î | Z |
| 8 | S | P | Î | ■ | A | Y | ■ | S | Î |
| 9 | B | ■ | N | A | L | ■ | N | A | N |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | ■ | | ■ | | | ■ | |
| 3 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 4 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 5 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 8 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 9 | | ■ | | | | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Dirav... Di dîrokê de dewleteke Kurdan
2. Nexweşiyek... Ne kevin
3. Rehîbê Budayan... Sê caran deh
4. Yezdanekî misrî... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin
5. Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê... Pirsek di rewşa ne tewandî de... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin
6. Notayek... Mektûb
7. Cejn, eyd... Bêyom
8. Destûr... Îrade
9. Erkedarê ku di keştiyan de xizmeta rêwingan dike

### JOR-JÊR

1. Dijberê rengî spî... Kar û xebat
2. Otêlên lûks an jî avahiyên wurşedar... Îşaret, şop
3. Ardê ku ji ber bêjingê maye
4. Paytexta Îtalyayê... Peyva neyînî
5. Paytexta dewleta asûriyan ku ji aliyê împaratoriya Medyayê hilweşiya ye
6. Pêxemberek... Kesê ku di karekî de xwedî rayeya fermankirinê ye
7. Bajarekî me... Tûj
8. Rojek beriya îro... Wext, zeman

## 'Dewleta tirkî ya faşîst wê di vî şerî de bifetise'





Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê êrişên dagîrkeriya tirkî şermezar kirin û gotin, dewleta tirkî di krîzekê mezin de ye û derveyî şer ti riyên wê yên xwexilaskirinê nemane. Lê wê di vî şerî de bifetise...***R-2***

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 972 | 19-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/


# NPG: Dost û dijminan dît ku ketina Kurdistanê ne hêsan e

NPG'ê peyama pîrozkirinê ji bo gerîla weşand û got, dost û dijminan her kesî dît ku ketina dagîrkeran ya Kurdistanê ne hêsan e. Fermandar û şervanên di van çalakiyan de keda wan heyî, ji ber ruhê êrişê yê bilind, rêbaza lêdanê ya encamgir û taktîkên gerîla yên afirîner, em hemûyan pîroz dikin...***R-3***



## Casmî Saz: Dewleta Tirkan bi hunerê jî êrişê Kurdan dike

Hunermend Casmî Saz ji ber vexwendina hunermendekî faşîst yê Tirk ji bo Dihokê, rexne li berpirsên Herêma Kurdistanê kirin û got, dewleta Tirkan êrişê huner, çand, wêje û rewşenbiriya Kurdan dike...***R-7***



## Li Qamişlo zêdebûna nexweşiya jehriyê

Di demên dawî de, gelek rewşên jehrîbûnê, cefaf û sehaya li bajarê Qamişlo çêdibin. Derheqê vê mijarê de doktorên nexweşxaneya Selam dan zanîn ku sedema nexeşiyê germa zêde, tinebûna elektirîka herêmê û qirêjiya xwarina derve ye...***R-6***



## Çiyakurd: Li hemberî êrişeke gengaz, wê berxwedan mezin be



Bedran Çiyakurd teqez kir ku, êrişeke nû ya dewleta tirkî wê çeteyên DAIŞ'ê zindî bike û got, divê ti kes nebêje armanc herêmek tenê ye, armanca Tirkiyê xaka Sûrî giştî ye. Ji bo şkandina vê projeyê jî, Rêveberiya Xweser û tevayiya sazî û gelên herêmê bi tevayiya derfetan wê tekoşineke mezin bikin û xaka xwe ji dagîrkirinê biparêzin...***R-4***

## Sorxwîn Avesta: Emê rojekê tenê jî rehet ranezin



Ji fermandarên Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Savaş Mereş ya Cenga Xabûrê Sorxwîn Avesta got, ev şer sed salî jî dewam bike, heta ku welatê me azad nebe, heta ku ev faşîzm ji Kurdistanê neyê qewirandin, emê nesekinin. Emê rojekê tene jî bi rehetî ranezin û wê Zap ji bo dewlata faşîst bibe goristan...***R-4***

## Rojnamevan: Emê pênûs û kamerayên hevalên xwe li erdê nehêlin...R-5

# ‘Dewleta tirkî ya faşîst wê di vî şerî de bifetise’

Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê êrişên dagîrkeriya tirkî şermezar kirin û gotin, dewleta tirkî di krîzekê mezin de ye û derveyî şer ti riyên wê yên xwexilaskirinê nemane. Lê wê di vî şerî de bifetise.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, Erdogan û çeteyên wî gefên xwe yên ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê planên qirêj didin pêş. Li ser vê mijarê Rêvebera Desteya Jinan ya Olî ya Konfransa Islamî ya Demokratîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê Emîra Izo û Endama Hêzên Parastina Cewherî Wedha Hisê ji me re axivîn.

**‘Derveyî şer riyeke din li pêşiya wan nemaye’**

Emîra diyar kir ku ji destpêka krîza Sûriyê ve, dewleta tirkî ya dagîrker gefên dagîrkirinê li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dixwe û axaftina xwe wiha domand: “Dewleta tirkî ya dagîrker, dixwaze xwe li bakurê Sûriyê bi cih bike û siyaseta xwe li ser vî bingehî dide meşandin. Tirkiye dewleteke netewperest û faşîst li ser asta Rojhilata Navî tê nasîn. Her dem hewl dide vegere Mîsaqê Milî, ango hewl dide bakurê Sûriyê û Iraqê dagîr bike. Rayedarên Tirk li dû xewn û xeyalên vê dagîrkirinê ne û bi şev û roj planan saz dikin. Li ser vî esasî Tirkiye dixwaze ji krîzên Rojhilata Navî sûdê bigre û dagîrkirina xwe li herêmê fireh bike.”

Emîra da zanîn ku siyaseta dewleta tirkî ya faşîst ji her kesî re eşkere bûye û wiha dewamî da axftina xwe: “Siyasta dewleta tirkî zelal e û Projeya Biratiya Gelan ya demokratîk û aştîxwaz, ya li ser bingehê wekheviyê ava bûyî qet qebûl nake. Tirkiye zelal dibêje, hebûna statûyeke demokratîk ji me re xeter e. Ji ber wê, gef û êrişên dagîrkeriya tirkî li ser herêmê wê her tim di rojevê de bin. Dewletên faşîst her ku di hundirê xwe de lawaz dibin êrişên leşkerî pêk tînin.”

**‘Ti hêzên dewletî gel naparêzin’**

Emîra bal kişand ser krîzên hundirê Tirkiyê û wiha axivî: “Dagîrkeriya tirkî di krîzeke aborî, siyasî, doplomasî û civakî de derbas



dibe. Dewleta tirkî tengav bûye. Hikumeta AKPê dixwaze krîzên di hundirê Tirkiyê de derbasî welatên derdorê bike. Mînakên li ber çav, deswerdana wê di krîzên tevayiya welatên herêmê de ye. Derveyî şer rêbazeke din li cem nemaye.” Rêvebera Desteya Jinan ya Olî ya Konfransa Islamî ya Demokratîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê Emîra Izo ji gelên herêmê xwest ku rêxistinbûna xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîst e Em hêza civakê esas bigrin û li sere bingehê çanda gelê berxwedêr li ber xwe bidin. Lewra ti hêzên dewletî wê gel neparêzin. Çavên dewletên faşîst li ser herêmên Rêveberiya Xweser e. Niha ji bo berxwedana li hemberî êrişan amadekaaraî di asteke bilind de ye.”

**‘Siyaseta dagîrkeran li her qadê têk diçe û wê têk biçe’**

Endama Hêzên Parastina Cewherî Wedha Hisên jî êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û Herêmên Parastina Gel (Medya) şermezar kirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ji ber têkçûna dagîrkeriya tirkî li çiyayên Kurdistanê êrişên xwe yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirin. Ji ber têkçûna wê li Herêmên Prastina Gel (MEDYA ), bi awayekî hovane êrişî bakur û rojhilatî Sûriyê dike. Siyaseta dagîrkeran li her qadê têk diçe”

**‘Sembola Jina Azad YJA Star e’**

Wedha diyar kir ku dagîrkeriya tirkî jina azad li seranserê Kurdistanê dike amanca êrişên xwe û wiha got: “Dagîrkeriya tirkî li hemberî hêza jinê bêçare maye. Hêza jinê her ku diçe mezintir dibe û dibe bingehê guhertina civakê. Eger civak were guhertin û ber bi azadiyê ve biçe, wê dagîrker nikaribin



desthilatdariya xwe bidomînin. Li hemberî êrişên dagîrkeriyê li bakur û rojhilatê Sûriyê û li qadên gerîlayan berxwedeneke mezin heye. Sembola jina azad YJA Star temenekî wê yê dirêj yê têkoşîn û berxwedanê heye û isbat kir ku jin li her qadê dikare têkoşînê bike. Ji ber wê berxedana wê bêhempa ye. Me jî hêza xwe ji vî bingehî, ji vê felsefeyê girtiye.”

Endama Hêzên Parastina Cewherî Wedha Hisên ji gelên herêmê, bi taybetî ji jinan xwest ku têkoşîna xwe bihêz bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Ji her kesî tê xwestin ku li dora hêzên berxwedanê bibin xelek û nirxên hatîn bidestxistin biparêzin. Herwiha pêwîst e jin di vê pêvajoya hesas de erkê xwe pêk bînin û bibin pêşengên têkoşînê.”

# `Êrişên ser jinê bi armanca têkbirina şoreşê ne`

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Berdevka Kongreya Star ya kantona Qamişlo Şaha Xelîl diyar kir ku hedefgirtina îrade û hebûna jina azad, hedefgirtina şoreşa Rojava ye. Herwiha got, tevî êrîşên mezin û sîstematîk, jinan ji bo bidestxistina azadiya xwe, têkbirina dagîrkeriyê û zihniyeta baviksalarî gavên mezin diavêjin.**

Di dîrokê de ya civak ava kirî jin e, bi destê jinê komînalî û rêxistina civakê hat avakirin. Lê tevî wê jî, bi hezarê salan e li ser jinê zor û şidet heye û mafê wê tê binpêkirin. Êriş û cureyên hovîtiyê yên li ser jinan, bi armanca binxistina civakê tên kirin. Çimkî civaka jin tê de azad be, ew civak jî azad e.

Di kesayeta jinan de sîstema desthilatiya mêr tê meşandin û her tim ji bo berjewendiyên xwe jinê dikin amanc. Dewletên dagîrker dixwazin, di her aliyê jiyanê de jinan bikin amanca sereke û wan bifetisînin, ji bo wê jî di her êrişê de despêkê berê xwe dide jinê. Herwiha bi kuştin û revandina jinan, dixwazin civakê bişkînin û tirsê bixin nava gel. Lê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, li dijî her cureyê tundî, inkar û qirkirinên ku ji aliyê rejimên desthilatdar ve tê meşandin, jin li ber xwe didin û têkoşînê dikin. Heriwha ji bo azadiya hemû jinên cîhanê jî têdikoşin. Têkildarî êriş û hovîtiya ku li ser jinan tê meşandin, herwiha têkoşîna jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ya li dijî êrişan, Berdevka Kongreya Star ya Kantona Qamişlo Şeha Xelîl nêrînên xwe anîn ziman.

**`Dixwazin bi hedefgirtina jinê destkeftiyên şoreşê winda bikin`**

Şeha Xelîl da zanîn ku di Şoreşa Rojava de rola herî sereke ya jinê ye û axaftina xwe wiha domand: “Jina Rojava bûye pêşenga şoreşê û mînaka tevayiya cîhanê. Di her alî de jin bûye pêşeng, aliyê siyasî, civakî, rêxistinî û fikrî. Her kes dibîne jinên YPJ`ê hem di milê leşkerî hem jî di aliyê fikrî de bûn mînak li ser asta cîhanî. Ji bo wê jî her tim êriş li ser jinê tên meşandin. Çimkî bi keda jinê û hêza wê şoreşek hat avakirin û heta niha jî parastina wê tê kirin û rojbiroj pêşketinên mezin tên dîtin. Dijmin jî vê yekê ji xwe re xeter dibîne û êrişî vê kedê dike; dixwaze destpêkê jinan têk bibe. Lewra eger îradeya jinan bê şkandin wê destkeftiyên şoreşê jî winda bibin. Dixwazin Bi hedefgirtina jinê destkeftiyên şoreşê winda bikin. Lê li dijî vê Rêbertî dibêje; ‘Eger tu bixwazî gelekî azad bikî, divê destpêkê jin di wê civakê de azad bibe. Ji bo wê jî eger jin azad nebe em nikarin gelekî azad bighînin.”

**`Her ku jin serî hildide êriş li serê tên kirin`**

Şeha got, li kêleka berxwedan û têkoşîna li Rojava, êrişên giran li jinan tê kirin û şerê taybet jî tê meşandin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Dijmin baş dizane, eger dest dayne ser jinê wê şoreşê têk bibe. Her ku jin serî hildide û li hemberî dijmin têkoşînê dike, êriş li ser wê tên kirin. Mînaka vê yekê jî hedefgirtina siyasetmedara Partiya Paşrojê Hefrîn Xelef û bi sedan jinên mîna wê bûn. Ji ber ku van jinan ji bo azadiya jinê û paşroja wê, herwiha ji bo serkeftina şoreşê dixebitîn hatin hedefgirtin. Ev êriş û hovîtî heta niha jî didomin. Bi taybetî di dema dawî de li herêmên rizgarkirî êrişên ser jinan û desthilatdarî zêde dibe. Herwiha çeteyên ku ji



wir hatinbûn derxistin, dixwazin careke din xwe li van herêman birêxistin bikin. Ji bo wê jî pêwîst e jin xwe baş birêxistin bike, da ku karibe lidijî êriş û zihniyata heyî derkeve û nehêle ti kes bandorê li fikrê wê bike.”

**‘Tevyiya şoreşên ku li cîhanê hatine hilweşandin tev ji ber nerêxistinkirina jinê bûn’**

Şeha Xelîl bal kişand ser şerê taybet û wiha pê da çû: “Dema em dibêjin Şerê Taybet tê wateya ku her tişt di nav de tê meşandin. Di şerê taybet de ji her alî ve êriş li ser me jinan tê kirin. Ji bo wê jî eger em jin ne hişyar bin û di milê zihnî de ne pêşketî bin emê wek tevgera jin winda bibin û emê şoreşa Rojava jî bi xwe re winda bikin. Tevyiya şoreşê ku li cîhanê hatine hilweşandin tev ji ber nerêxistinkirina jinê bûn. Ji bo vê jî pêwîst e tevayiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê helwest û nêrînên me yek bin. Gerek jin ji êrişên ku li ser wan tên kirin hişyar bin û pêşî li hedefgitina jinê bigirin. Herwiha destkeftiyên şoreşê biparêzin.”

Berdevka Kongreya Star ya Kantona Qamişlo Şeha Xelîl di dawiya axaftina xwe de got, wek jin kar û xebat ji bo me ne bes e, divê em di milê zihnî de xwe baş ava bikin da ku em karibin xwe azad bibînin û şoreşê jî bi xwe re xurd bikin.



# Casmî Saz: Dewleta Tirkan bi hunerê jî êrişê Kurdan dike

Hunermend Casmî Saz ji ber vexwendina hunermendekî faşîst yê Tirk ji bo Dihokê, rexne li berpirsên Herêma Kurdistanê kirin û got, dewleta Tirkan êrişê huner, çand, wêje û rewşenbiriya Kurdan dike.

Şeva 7’ê Hezîranê li Zanîngeha Emerîka ya Dihokê ku Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî malûvaniya wê dikir, bi amadebûna Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî, şahiya mezûniyeta xwendekaran pêk hat. Ji bo şahiyê li ser vexwendina Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî stranbêjî Tirk ê faşîst ê bi navê Mistefa Cecelî jî amade bû.

Di derbarê mijarê de Hunermend Casmî Saz got: “Bi salane dewleta Tirk êrişên nerewa dike ser gelê Kurd. Bi taybetî êrişê ser Qendîl û Rojavayê Kurdistanê dike. Di heman demê de jî êrişê ser huner, çand, wêje û rewşenbiriya gelê me dike. Vê yekê jî bi rêya weşandina rêze filman dike. Di rêze filmên xwe de sivgahî bi navê Kurdan dikin.”

Casmî Saz da zanîn li Tirkiyeyê dema hunermendek Kurd sitranek dibêje bi hezaran kes êrişê ser dikin, yan jî tên girtin, lê berpirsên hikûmeta Herêmê jî pêşwaziyê li hunermendên Tirk dikin.

Di dewamê de Hunermend Casmî Saz da zanîn di salên borî de berpirsên Herêmê Îbrahîm Tatlises anîn li Herêma Kurdistanê avahî li ser navê wî qeyd kirin û li nava Kurdistanê di gerandin, niha jî hunermendek din ê Tirk anîne



nava zanîngehê û dixwazin bi vê rêyê hunera gelê Kurd winda bikin. Tê gotin ku di beramberî hatina hunermendê Tirk ji bo şahiya zanîngehê de 120 hezar dolar hatiye dayîn. Ji bo piştrastkirina vê yekê sê rojin pirs ji Zanîngeha Amerîkî a li Dihokê tê kirin, lê bersiva vê pirsê nade.

***ROJNEWS***

# Jinên Kurd yên li dîasporayê wê di Festîvala Jinan ya Zîlan de werin gel hev

**Komîteya Amadekar pirsên me yên derbarê 16an ya Festîvala Jinan a Zîlan ku li Ewropayê ji aliyê jinên Kurd ên li dîasporayê ve tê organîzekirin, bersivand. Li aliyê din dê jin di festîvalên li Elmanya û Fransayê de jî li hev bicivin.**

Têkoşîna azadiyê ya jinan ku sînoran derbas dike, berxwedan, yekîtî û têkoşîna li dîasporayê mezin dike. Li Ewropayê Jinên Kurd ên li dîasporayê ji sala 2004’an û vir ve di bin banê “Festîvala Jinan a Zîlan”de li hev dicivin.

Komîteya Amadekar a 16’emîn Festîvala Jinan a Zîlan pirsên me bersivand.

***Em ji serî de dest pê bikin. Îsal 16’emîn Festîval tê lidarxistin. Fikrê festîvalê çawa ava bû?**

Festîvala yekem di 18’ê Hezirana 2004’an de pêk hat. Biryara festîvalê ji bo ku bi hêza jinê û bi keda jinê re rêxistinbûna jinê were xuyakirin û di vê wateyê de di warê jin hem di civakê de hem jî di nava pergalê de ji nû ve ji xwe re bi avakirina qadên azadiyê cih dîtina wê de, girîng bû.

***Ji bo we wate û girîngiya vê festîvala ku bi salan e tê lidarxistin çi ye, hûn dikarin qal bikin?**

Ev festîval di xebatên jinan de xwedî cihekî girîng e. Girîng e ku ev festîval ji aliyê jinan ve ji bo jinan tê lidarxistin. Li gel vê ji bo jin di nav pergalê de rêxistinbûna xwe bibîne û bibîne ku di warê civakî, çandî, siyasî, perwerdehî û hûnerî de xebat dide meşandin û ji bo xwe gihandina hêza xwe jî pir girîng e. Ji ber ku hem ji aliyê sazî û hem jî ji aliyê xwe ve daxwaz û xwestekên xwe bi hêza derdixe holê û ji ber ronîkirina kedeye em girîngiyeke mezin didin festîvalê.

**“Zîlan îradeya jinê temsîl dike”**
***Navê “Zîlan” ji bo jinên Kurd ên li dîasporayê wateyek çawa hildigre?**

Çawa ku têkoşîn û çalakiya Zîlan ji bo jinê pîvana welatparêziyê ye, di heman demê de jî wek jin hilweşandana nêrîna jinê ya ji aliyê civak û pergala ve li ser jinê hatiye ferzkirin e. Di vê wateyê de Zîlan îradeya jinê, xweseriya xwe û jina ku îade wê yê sembolîzê dike. Wekî ku di guhertin û veguhertina civakî ya jinê de xwedî gotine û vîna felsefeya jinê ya jiyanê û perspektîfa wê derdixe holê, di pîvana jinê de jî temsîlata xetek azadiyê ye.

**Hûn ji destpêka rêxistinbûna ve heta niha, di organîzekirina festîvalê de tu carî rastî zehmetî û astengiyan hatin?**

Na. Çawa ku di pîvana jinê de tu pirsgirêk nehat jiyîn, hin zêdetir di warê xwedî derketinê de pêşdebir bû. Em dizanin ku pergal çawa dest digre. Lê belê Zîlan baş dizane ku ew felsefeya jiyana me jinan e. Em ji aliyê xwe ve mîrateya ku heval Zîlan ji me re hiştiye bi înadî didin jiyîn. Armanca me ew e ku em wê dewrê nifşên pêşerojê bikin û nemir bikin.

**Têkoşîna jinên Kurd belav bû**
*** Li Ewropayê wateya festîvaleke wiha çi ye? Tevlîbûn, fikir û ramanên jinên Ewropayê çi bû?**

Pir girîng e ku em mîrateya ku heval Zîlan ji me re hiştiye xwedî derbikevin û rêxistinbûna jinan ya li dora vê nirxê pêk binîn. Di vê wateyê de bi esasbûna beşdarbûna




rêxistinên jinan ên biyanî yên ji derdorên cuda û welatê ku em lê dijîn re girîng bû. Em bi perspektîfa danasîna têkoşîna jinên Kurd û vîna jinê veguherandina têkoşînekê hevpar nêzî yekemîn festîvalê bûn. Wekî di eksena Festîvala Zîlan a ku em bi salan e li dar dixin de, ev yek bi rola jinê ya di berxwedana Kobanê de gihişt astek gerdûnî. Wekî bi dîtina van rojan nêzîkatî û perspektîfa ku me di şexsê heval Zîlan de pêkanî, encam girt, hesabên pergalê yên li ser jinan ya di roja me ya îroyîn de jî vala derxist.

**“Em hemû bi hev re li berxwe bidin”**
*** Hûn dikarin behsa naveroka festîvalê bikin? Dê kî cih bigrin? Îsal çi hene, tê plankirin ku heta kengê bidome?**

Weke ku hûn jî dizanin ew du salên dawî ji ber şewbe me nekarî festîvala xwe li dar bixin. Ji ber vê yekê îsal ji bo me girîng e. Em amadekariyên xwe dikin. Pêvajoya şewbê ew derxist holê; her çend tê gotin ku ev pergal di qada hiqûqî û civakî de ji bo jinan azadî afirandiye jî, me dît ku bi rastî ne wisa ye. Di van 2 salên dawî de bi sedan jin hatin qetilkirin û bi hezaran jin vegotin ku rastî tundiyê hatine. Çawa ku şewb nêzîkatiya pergalê ya li hemberî jinê deşîfre kir, zincîrên koletiyê ya jinê a nedîber, da xuya kirin. Di vê wateyê de ev festîvala me ji bo jinan hevditînek mezin û nîşaneya rêxistinbûna wan e.

Li aliyê din di bin siya şerê Ûkraynayê de li Kurdistanê şerekî qirêj tê meşandin û ev yek jî bi taybet jinan li ser gelê Kurd qirkirinê ferz dike. Dê festîvala me jî bersivek van hemûyan hebe. Em ê di festîvalê de daxwaza xwe diyar bikin ku em tu carî vî şerî qebûl nakin û li dijî vê em ê bi bilindkirina têkoşîna xwe bersivê bidin. Em hemû jin û dostên xwe vedixwînin 16’emîn Festîvala Zîlan a îsal. Em bang dikin ku em ê li dijî van hîleyên qirêj ên ku hem yê pergal hem jî yê şer ya li jinan û civakan ferz dike, bi xurtkirina rêxistinbûna xwe bersiv bibin.

Di festîvala me de wekî ku dê hunermendên me yên ji 4 parçeyan derkevin ser dikê, gelek saziyên jinan jî dê konên xwe yên agahdarkirina xebatê xwe vekin. Jinên nivîskar hem dê pirtûkên xwe bidin nasîn hem jî bi xwînerên xwe re li hev bicivin. Komên muzîkê jinan yên ciyawaz dê derkevin ser dikê. Di vê wateyê de werin festîvala me ya îsal ya di eksana dirûşmeya “Li ber xwe bide, xwe bi rêxistin bike, azad bijî” de em hemû bi hev re li berxwe bidin, rêxistinbûna xwe hîn xurtir pêş bixin û ji bo jinan qadên azad ava bikin.

**Jinên Kurd li Almanya û Fransayê wê werin gel hev**

Jinên Kurd dê di festîvalên ku dawiya hefteyê li Frankfûrt a Elmanyayê û li paytexta Fransa Parîsê tên lidarxistin de li hev bicivin. Vê mehê, bi dirûşmeya “Li ber xwe bide, xwe bi rêxistin bike, azad bijî” re li gelek navendên Ewropayê ji bo jinên Kurd festîval tê lidarxistin. Starta festîvalê di 4’ê Hezîranê de ji aliyê TJK-Swêd ve li bajara Goteborgê hat dayîn.

**Wê di 18’ê Hezîranê de li Frankfûrt û Parîsê bê lidarxistin**

16’emîn Festîvala Jinan a Zîlan dê 18’ê Hezîranê roja Şemiyê li bajarê Frankfûrt ê Elmanyayê li navnîşana “Walther-von-Cronberg-Platz 4 60594 Frankfurt am Main” bê lidarxistin. 5’emîn Festîvala Jinan a Fîdan Dogan (Rojbîn) ku bi pêşengiya Tevgera Jinên Kurd a Fransayê (TJK-F) tê organîzekirin jî dê di 18’ê Hezîranê de bê lidarxistin. Jinan li herêma Parîs Val de Marne ku dê dawiya hefteyê bi rengê jinan were nuxumandin, li Parc Inderdepartementalê li hev bicivin. Festîvala Jinan a Zîlan ku her sal wek kevneşopî ji aliyê Meclîsa Jinê ya Jiyan ve tê lidarxistin, îsal ya 17’emîn tê orgenize kirin. Amadekariyên festîvala ku dê di 26’ê Hezîranê de li Londona paytexta Îngilîstanê bê lidarxistin, hat qonaxa dawî. Festîvala ku wekî her sal dê îsal jî gelek çalakî cih bigre, dê li navnîşana “Navenda Civaka Kurd, 11 Gardens Portland, Harringay Ladder, London N4 1HU” were lidarxistin. Li Swîsreyê jî 9’emîn Festîvala Sakîne Cansiz, bi pêşengiya YJK-Swîsreyê û bi piştgiriya gelek sazî û rêxistinên wekî Women Defend Rojava, Frauen Lesben Kasama, FEDA, BASTA re, dê di 26’ê Hezîranê de bê lidarxistin.

***JINHA***

# Li Qamişlo zêdebûna nexweşiya jehriyê

Di demên dawî de, gelek rewşên jehrîbûnê, cefaf û sehaya li bajarê Qamişlo çêdibin. Derheqê vê mijarê de doktorên nexweşxaneya Selam dan zanîn ku sedema nexeşiyê germa zêde, tinebûna elektirîka herêmê û qirêjiya xwarina derve ye.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji ber germayî û qirêjê gelek nexweşiyên hinavê bi mirov re çêdibin, bi taybetî bi zarokan re. Herwiha gelek nîşanên hinavêşê weke gêjbûn, vereşan, êşa zik, kezeb, ta û sermayê hene. Ev nîşan piştî xwarina xwarekên qirêj bi çend saetan yan jî piştî çend rojan xuya dibin. Li bajarê Qamişlo jî gelek kes bi nexweşiya hinavê ketine û piştî ku nîşan li wan xuya bûne, derbasî nexweşxaneyê bûne. Li her nexweşxaneyê rojane nêzî 10 nexweş wiha çêdibin. Piraniya nexweşan jî zarok in.

Derbarê nexweşiyê û sedemên wê de welatî, doktor û berpirsê nexweşxaneya Selam ya bajarê Qamişlo ji me re axivîn û nêrînên xwe anîn ziman.

**\`Rojane nexweşên jehrîbûnê û sehaya li nexweşxanê hene\`**





Berpirsê rewşên awarte yê Nexweşxaneya Selam Elî Remedan Ehmed da zanîn ku rojane nexweşên jehrîbûnê û sehaya tên nexwşxanê û axaftina xwe wiha domand: “Nêzî heyvekê ye ev nexweşî di nava gel de belav bûye. Her roj nêzî 6 nexeşî tên gel me. Li her nexweşxaneyê nexweşên jehrîbûnê çêbûne. Piştê ku rewşa hewayê hat guhertin û germ zêde bû ev nexweşî derket. Destpêkê rewşên nexweşiya sehaya zêde bûn pişt re yên jerîbûnê çêbûn. Nexweşî herî zêde bandorê li zarokan dike. Ji ber wê zarok dereng rehet dibin.”

Elî Remedan got, dema nexweş tên nexweşxanê em di cih de sîromê girê didin, da ku nava wan paqij bibe. Nêzî saetekê nexweş di binê çavdêriyê de dimîne. Pişt re her nexweş li gorî nîşanên pê re çêdibin derman jê re tê dayîn.

**\`Paqijiya me parastina tenduristiya me ye\`**

Welatiya bi navê Tirkiya Mihemed Elî ku kurê xwe yê bi nexweşiya jehriyê anî nexweşxanê ji mer wiha axivî: “Kurê min 3 salî ye. Du roj in bi nexweşiya jehriyê ketiye. Despêkê ku nexweş ket laşê wî germ dibû û pir vedirşiya. Herwiha ji ber germa zêde kêmbûna elektirîkê û qirêjiya derdorê gelek zarok nexweş dikevin. Çimkî zarok ne weke mezinan in û nexweşî zû bandorê li wan dike.”

Di dawîya axaftina xwe de Tirkiya got, ez bi hêvî me gelê me li paqijiya derdorê baldar be. Çimkî eger em paqijiya xwe paşguh bikin wê gelek nexweşiyên din derkevin. Ji bo wê jî baqijiya me parastina tenduristiya me ye.

**\`Sedema sereke ya nexweşiyê guhertina hewayê ye\`**

Doktorê hundir û damaran Ehmed Hac Îbrahîm ji me re behsa sedema derketina nexweşiya jehriyê û sehaya vê dawiyê kir û wiha got: “Sedema sereke ya nexweşiyê guhertina hewayê û germaa zêde ye. Herwiha got, nexweşiya sehaya herî zêde ji iltîhabê çêdibe.





Ev nexweşî piranî bi zarokan re çêdibe, dema ku nexweşî giran dibe rewşa cefafê jî bi wan re çêdibe. Jixwe yên mezin jî piraniya wan bi jehriyê dikevin. Ev jî ji ber xwarina xwaringehan e, çimkî hin xwaringeh ne zêde paqij in, dema mirov wê xwarina qirêj dixwe bi jehriyê dikeve. Ne xwaringeh tenê dema mirov zebze yan jî xwerek ji derve anî malê, pêwîst e li paqijiya wê baldar bin.”

**Tedawî û parastina tenduristiyê ji paqijiyê dest pê dike**

Di dawiyê de doktor Ehmed Hac Îbrahîm bîr xist ku tedawî û parastina tenduristiya mirov ji paqijiyê dest pê dike, bi taybetî paqijiya xwarin û sebzeyan. Herwiha got, pêwîst e mirov di carekê de ji ber germê neçe ber sermayê.

## Jinên Êzîdî digel êrişan li ser şopa Bêrîvanê xwe perwerde dikin

**Li Şingalê Akademiya Şehîd Binevş Agal ya girêdayî Tevgera Azadiya Jinên Êzîdxanê (TAJÊ) ji bo jinan dest bi dewreya perwerdeyê ya bi navê Şehîd Fereşîn kir.**


Digel êrîşên dijwar yên bi çek û şerê taybet li ser sîstema xwerêvebirinê ya Şingalê, welatiyên Şingalê, bi taybetî jinên Êzîdî di xebata avakirina xwe û civaka xwe de paşve gav navêtine. Jinên Êzîdî ji bo parastin û avakirina xwe kedeke mezin didin. Jin ji bo pêşxistina berxwedanê, girîngî didin xweavakirinê jî. Jinên Şengalê perwerdeyê weke pêngava yekem a xweavakirinê digrin dest. Jinên Êzidî piştî fermana 74’an ji bo tola xwe ji zîhniyeta DAIŞ’ê bigrin, di her milî de xwe perwerde dikin. Yek ji wan milan jî perwerdeya fikrî ye.

Piştî fermanê, Tevgera Azadiya Jinên Êzidî TAJÊ bi dehan dewreyên perwerdeyê vekir. Akademiya Şehîd Binevş ji bo jinên Êzidî bu mala perwerdeyê û hema hema her mehê dewreyeke perwerdeyê vedike. Dewreya perwerdeyê ya vê mehê bi navê Şehîd Faraşîn bi beşdarbûna 7 jinan dest pê kir.

Jinen ku beşdarî perwede bûn dibêjin ku ew kêfxweş in îro dikarin xwe perwerde bikin, bi saya perwerdeyê fêr dibin û fêr dikin.

“Bi saya fikrên Rêber Apo pergala li Şangalê ava bû”

Endama Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) Nurê Şengalî girîngiya perwerdeyê ji bo jinên Êzidî û hestên xwe anî ziman û wiha got: “Em li ser gelek beşan perwerde dibînin. Perwerde me li ser jin û malbat, li ser rastiya serokatî, şerê taybet û gelek mijarên din. Em çiqas xwe perwede bikin jî kêm e. Em bi her tiştê xwe deyndarê Serok Apo ne. Em çiqas xwe perwerde bikin ewqas pêşketin û xurtbûn di civaka me de wê çêbibe. Di rastiya serokatî û jiyana serokatî de, ji zaroktiya wî heya roja me ya îro tekoşîn heye. Hewldana wî ji bo me gelek watedar bû. Her wiha derketina serokatiyê gelekî gurhertin di civaka me de çêkir. Di civaka me ya Êzidî de herî zêde jî jin ji fikrên Rêber Apo bi bandor bûn. Em li ser fikrên Serok Apo têdikoşin. Sîstema ku di Şengalê de ava bûye li ser fikr û keda wî ava bûye.”



Bi perwerdeyê hêza xwe afirandin

Endama Meclisa TAJÊ ya gundê Digurê Cîlan Jiyan jî nêrînên xwe anî ziman û wiha pêde çû: “Her tiştekî ku ji bo mirov heqîqetê îfade bike, ew ji bo me dibe perwerde. Ev 5 roj in em di perwerdeyê de ne. Em 7 kes in û ji bo me hem jiyan hem jî perwerde gelek baş derbas dibe. Berê em gelek tiştan nizanibûn. Em jin gelek bê zanebûn hatibun hiştin. Em di malê de zindankirî bûn. Îro em ji dewletê bigre heya her cure zordestiyê li ber xwe didin. Civaka me ji dewletan ditirsiya lê niha her dem em xwe perwerde dikin tirsa xwe derbas dikin. Ev cesaret bi saya fikrên Serok Apo çêbû. Em bawer dikin ku wê rojek serok Apo were û ev roj wê bibe azadiya Êzidiyan. Em bi fikrên serokê xwe bi hêz bûn.”

Hêjayê bi bîrxistinê ye ku Şehîd Feraşîn Şenglî îsal di 19’ê meha Nîsanê de, di êrîşa artêşa Iraqê ya li ser asayîşa Êzidîxanê de şehîd bû.

***JINHA***

## Li Tirbespiyê bi xwedîkirina kurmikan semada xwezayî tê afirandin

**Li gundekî navçeya Tirbespiyê kooperatîfek bi xwedîkirina cureyekî kurmikan, li şûna semada kîmyayî semada xwezayî hildiberîne.**

Ji destpêka damezirandina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve, jiyana komînal, ji girîngtirîn stûnên avakirina civakê û pêşxistina wê ye û li ser wê bingehê gelek projeyên komînal li herêmê bi rêya kooperatîfan hatin çêkirin.

Li gundê Hasûdê yê navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişloyê 5 kesan di nav de pisporekî çandiniyê heye, kooperatîfeke cuda ava kir. Armanca kooperatîfê, bes bikaranîna semada kîmyewî û bi rêya kurmikan hilberandina semada xwezayî ye.

Ew kooperatîf beriya salekê hatiye damezrandin, lê wan di peydakirina kurmikên taybet ên ji bo hilberandina semada xwezayî de zehmetî kişandin.

Piştî gelek hewldanan, wan karîbûn ji paytexta Sûriyê Şamê, 2 hezar û 500 kurmikan peyda bikin û dest bi projeya xwedîkirina kurmikan bikin.

Tevî derfetên kêm jî lê kooperatîf di zêdekirina kurmikan de bi ser ket û îro di destê wan de derdora 5 hezar kurmik hene. Li gorî çavdêrên projeyê ew ê bikarin heta kêmî salekê kurmikan bidin cotkarên herêmê.

Semada xwezayî wiha tê çêkirin; kurmik bermahiyên zibilê dixwin û semada xwezayî didin, ji wê semadê re dibêjin “Kembost”.

Ev kurmik di nava gemara çêlekan de di hundirê tûran de heta 15 rojan tên hiştin, di nava tûran de pelên daran û hin sebze û êmê sewalan tê tevlihevkirin, piştre ev bermahî li hawizên kurmikan tê reşandin û bi avê hejmara kurmikan tê zêdekirin.

Her hêkeke kurmikan ji 3 heta 7 kurmikan dide, ev proje ji bo çêkirina semada xwezayî xwe dispêre hin cureyên kurmikan ên spî û sor.

Endamê rêveber ê kooperatîfê û çavdêrê projeyê Xelîl Salih ji ajansa me re got: “Axa çandiniyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber bikaranîna semada kîmyewî kêm berhem dide, ji ber wê me ev kooperatîf ava kir û me kurmikên taybet ji bo semada xwezayî peyda kirin.”

Salih diyar kir ku wan di peydakirina kurmikan de zehmetî kişand, piştî ku bi destxistin jî 3 mehan xwe perwerde kirin û li gorî tecrubeyên navneteweyî dest bi projeya xwe kirin.

Xelîl Salih da zanîn ku ew plan dikin di kêmî salekê de van kurmikan li ser cotkaran belav bikin da ku ji semada kîmyewî xilas bibin.

***ANAH***



# NPG: Dost û dijminan dît ku ketina Kurdistanê ne hêsan e

NPG’ê peyama pîrozkirinê ji bo gerîla weşand û got, dost û dijminan her kesî dît ku ketina dagîrkeran ya Kurdistanê ne hêsan e. Fermandar û şervanên di van çalakiyan de keda wan heyî, ji ber ruhê êrişê yê bilind, rêbaza lêdanê ya encamgir û taktîkên gerîla yên afirîner, em hemûyan pîroz dikin.

**Navenda Nûçeyan**

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) ev daxuyanî da:

“Dema ku mirov bala xwe dide ser agahiyên ku hêzên me vê hefteyê dane û çalakiyên ku lidar xistine; tê fêhmkirin ku ji aliyê bicihanîna rê û rêbazên gerîlatiya serdema nû ve asteke girîng hatiye bidestxistin. Bi ruhê êrişê yê bilind, bi lêdana aqilane, wêrek û tûj;

- 31’ê Gulanê li herêma Besta ya Botanê bi hostatî û hesasiyeteke mezin cerdevanên li pêş hatin hişyarkirin û astengkirin û piştre jî tenê li dijminê dagirker hate xistin û hate cezakirin.
- 4’ê hezîranê li navçeya Şaxê ya Wanê bi sûîqestê li dagirkerên li nîzamiyeya qereqola Tingê hate xistin û 2 dagirker hatin cezakirin.
- 8 û 9’ê Hezîranê li Qadên Berxwedanê yên Şehîd Şahîn û Karker bi çalakiyên sûîqestê yên serketî gelek dagirker hatin cezakirin.
- 9’ê Hezîranê li herêma Metînayê li Girê Ortê 4 dagirker ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hatin cezakirin, 5 jî birîndar bûn.
- 10’ê Hezîranê li Qada Berxwedanê ya Girê FM bi sûîqestê û taktîkên êrişê 4 dagirker hatin cezakirin.
- 10 û 11’ê Hezîranê tevî ku dagirkeran bi bombardûmaneke bi rojan a li ser qada Dola Şîvê xwestin bi pêş ve biçin, hêzên me yêyî windahiyê bidin pêşî li pêşveçûna dijmin girtin û 6 dagirker ceza kirin, droneyek jî xistin.
- 11’ê Hezîranê li Qada Berxwedanê ya Karker bi du taktîkên sabotajê yên serketî 5 dagirker hatin cezakirin, 2 dagirker birîndar bûn.
- 12, 13, 15 û 16’ê Hezîranê li Qada Berxwedanê ya Karker bi sûîqestê dagirker li ser hev hatin cezakirin.
- 13’ê Hezîranê li Qada Berxwedanê ya Girê FM bi çalakiyên serdegirtin û sûîqestê yên koordîneyî 10 dagirker hatin cezakirin, sîstemeke radarê hate îmhakirin.
- 14’ê Hezîranê li herêma Avaşînê li qada Mervanosê bi çalakiya gerîla ya koordîneyî 5 dagirker hatin cezakirin, 2 termal û sîstemeke kamera ya mobesse hatin îmhakirin.
- 15 û 16’ê Hezîranê li hemberî dijminê ku dixwest li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi pêş ve biçe, xefikeke mezin hate amadekirin û bi Operasyona Tolhildanê ya Şoreşgerî, gelek taktîk di nava hev de bi hostatî hatin bikaranîn, bêyî ku windahî bê dayin 57 dagirker û kontra bi rengekî serketî hatin cezakirin. Ev çalakiyên hatin lidarxistin ji çalakiyên sereke yên serketî ne ku derketin pêş.

Li ser bingeha pêngavên şoreşgerî yên Şehîd Şervan-Şehîd Diljîn Egîdên Botanê, Bazên Zagrosê û Cenga Xabûrê Şehîd Savaş Maraş, hevalên me li her derê bi tempoyeke bilind her roj bi her awayî, bi afirîneriya taktîkê, bi rêbaza lêdanê ya bi rengê baz çalakiyan lidar dixin. Bi taybetî li dijî dijminê ku dixwaze Zap, Avaşîn û Metînayê dagir bike her roj derb lê tê xistin, fatûreya sûcê dagirkeriyê timî lê tê birîn û cezakirin. Dost û dijmin her kesî dît ku ketina dagirkeriyê ya li Kurdistanê hêsan nîne.



Dilê gelê me û dostan bi berxwedana gerîla lê dide, bi çalakiyên serketî yên we hevrêyên me ku li ser xeta lehengiyê şer dikin, bi moral û hêvî tijî dibe. Li ser vê bingehê hesab ji dewleta Tirk tê pirsîn ku zarokên bêguneh ên gelê Kurd li Bamernê û Şengalê qetil dike, heyfa gelê me li erdê nayê hiştin. Vê ekê jî careke din nîşan da ku gerîla parêzvanê rasteqîn ê Kurdistanê û nirxên gelê Kurd e.

Tîmên bi tevger ên ku van çalakiyan lidar dixin, hevalên ku bi îradeyeke mezin li tunelên şer şer dikin, hemû fermandar û şervanên ku di van çalakiyan de keda xwe hene, ji ber ruhê êrişê yê bilind, rêbaza lêdanê ya encamgir û taktîkên gerîla yên afirîner, em hemûyan pîroz dikin.

Em bawer in ku Pêngava Şoreşgerî wê bi çalakiyên gelekî serketî û operasyonên şoreşgerî bênavber dewam bike. Em hevrêyên xwe hemûyan bi hezkirin û rêzdarî silav dikin ku bi ruhê fedaî şer dikin.”

## Li Kelarê dagîrkeriya tirkî wesaitek bomberan kir

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Li herêma Kelarê ya bajarê Silêmaniyê yê başûrê Kurdistanê, dagîrkeriya tirkî bi balafira bêmirov wesaitek bombaran kir. Di encamê de 4 welatiyan jiyana xwe ji dest da û yek jî birîndar bû.**

17’ê Hizêranê, 2022’an, li herêma Kelarê ya bajarê Silêmaniyê yê başûrê Kurdistanê, balafireke bêmirov ya dewleta tirkî ya dagîrker wesaitek bombebaran kir.

Hat ragihandin ku wesait li gundê Berlut yê bakurê Kelarê hatiye bombebarankirin. Li gorî çavkaniyên xwecehî di dema êrişê de 5 welatî di wesaitê de hebûn, di encama êrişê de 4 welatiyan jiyana xwe ji dest dan û welatiyek jî birîndar bû. Têkildarê vê êrişê, heta niha raeeyarên herêmê ti daxuyaniyên fermî nedane.

Bi bêdengiy hikumeta herêma Kurdistnê, hikumeta Iraqê û rêxistinên Navneteweyeyî , dagîrkeriya tirkî bi dehê caran e balafirên bêmirov wesaitên welatiyan li başûrê Kurdistanê dike hedefa êrişên xwe û di encamê de bi dehan welatî şehîd dikevin û birîndar dibin.



## QSD\`ê bîlançoya sûcên dewleta tirkî yên Hezîranê eşkere kir

**QSD\`ê bîlançoya sûcên dewleta tirkî ya dagirker yên meha Hezîranê yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê eşkere kir û wiha got : “Ev êriş ji bo berdewamkirina projeya guhartina demografiya herêmê pêk tên.”**

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyekê bîlançoya sûcên dewleta tirkî yên ji destpêka meha Hezîranê ve pêk anîne, eşkere kir.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin : “Artêşa tirkî û çeteyên wê sûcên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê bi hemû cureyên çekan dewam dikin. Her wiha hewl didin bikevin nuqteyên hêzên me yên li herêmên şer, lê hêzên me hewldanên wan têk birin, ruxmî piraniya wan herêman niştecih lê hene û dikevin nava peymanên agirbestê ku deweleta tirkî ya dagirker bi DYA û Rûsyayê re di Cotmeha 2019’an de îmze kirine.

Di nîvê meha Hezîranê de ev sûc hatine kirin:

Balafirên bêmirov ên artêşa tirkî 35 caran li asîmanê bakur û rojhilatê Sûriyê geriyan û maleke li Qamişloyê kir armanc.

Artêşa tirkî ya dagîrker bi 982 topên giran û bombeyên qedexekirî, herêm kir armanc.

Li herêmên Til Temir û Zirganê bi taybet gundên Til Şenan û Til Cuma yên Asûriyan bi dehan mal bi topan kirin armanc, nexasim perestgehên olî ku dêrek hate bombebarankirin.

Gundê Um Kêf ê Til Temirê bi 150 topên giran hat topbarankirin.

Li gundê Qesir Dîb zevî hatin şewitandin û cotkaran nekarî berhemên xwe biçinin, di encamê de gef li debara herêmê tê xwarin.

Bajarokê Eyn Îsa û bi dehan gundên wê yên li rojhilat û rojava bi 324 top, moşek û hewanan hat armanckirin, her wiha li navenda bajarok jî sivîl hatin bombebarankirin da ku wan bitirsin û bidin koçberkirin. Di heman demê de erebeyên li ser rêya M4 jî hatin hedefgirtin.

Bi 365 topban gundewarên bakurê rojavayê bajarê Minbicê hatin topbarankirin, mînaka wê jî burcê peywendiyan û perestgeha olî û malên sivîlan in.

Herêmên Şehbayê yên li gundewarên bakurê Heleb û navçeyên Şera û Şêrawa yên gundewarên başûrê Efrînê 141 caran hatin topbarankirin, ji wan klînîka li bajarokê Til Rifetê û topbarankirina malên welatiyan ên li wan herêman ku di encamê de ziyanên madî gihaştin mal û milkên wan, şivanek û pezê wî li gundê Tinib ê navçeya Şêrawa hatin hedefgirtin.

Li gelek herêmên gundewarên Efrînê ya dagirkirî bi armanca bicihkirina çeteyan, avahiyên mêtingeriyê lê tên avakirin, nemaze li navçeya Şiyê ya Efrînê.

Di dawiyê de em dibêjin; artêşa tirkî bi sûc û kiryarên xwe yên terorî û siyasetên revandin, talankirin û qetilkirinê dixwaze niştecihên resen koçber bibin û projeya xwe ya guhartina demografiyê pêk bîne. Ji ber ku siyaseta tirkkirinê heta niha li herêmên dagirkirî ranewestiyane. Hem navên gund û deverên giştî diguhere, hem jî al û wêneyên tirkî li ser saziyan û avahiyên fermî bilind dike. Li hemberî van siyasetan jî dewletên hêzên wan li Sûriyê û rêxistinên hiqûqî û mirovî, her wiha NY bê deng in.”

# Çiyakurd: Li hemberî êrişeke gengaz, wê berxwedan mezin be

Bedran Çiyakurd teqez kir ku, êrişeke nû ya dewleta tirkî wê çeteyên DAIŞ'ê zindî bike û got, divê ti kes nebêje armanc herêmek tenê ye, armanca Tirkiyê xaka Sûrî giştî ye. Ji bo şkandina vê projeyê jî, Rêveberiya Xweser û tevayiya sazî û gelên herêmê bi tevayiya derfetan wê tekoşineke mezin bikin û xaka xwe ji dagîrkirinê biparêzin.

**Xalid Etê/Qamişlo**

Têkildarî gefên dawî yên dewleta tirkî yên ser bakur-rojhilatê Sûriyê, rojnameya me bi Cîgirê Serokê Desteya Serokatiya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Bedran Çiya Kurd re hevdîtinek pêk anî.
Hevdîtin wiha ye:




**Dewleta Tirkan ya dagîrker bi salan e, bênavber siyaseta êriş û qirkirinê li ser bakur û rojhilatê Sûriyê dimeşîne, armanca van êriş û polîtîkayan çi ye?**

Di dîrokê de, Tirkiye li ser bingehê dijberiya vîna gelan hatiye avakirin. Lewra dewleta Osmanî 400 salî li ser parçekirina gelan û têkbirina vîna wan domand. Bi krîza Sûriye jî Tirkiyê destwerdana wê kir. Ev krîz di berjewendiya siyaset û ajandeyên xwe de bi kar anî. Hin Sûrî himbêz kirin û ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn û bi wan bazirganiya siyasî û leşkerî kir. Îro Tirkiye ji bo rêgirtina li çareserî û lihevhatina Sûriyê bi awayekî veşartî siyaseta xwe dike. Bi taybetî hewl dide ezmûna demokratîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji holê rake. Ev ezmûna ku bi beşdariya tevayiya gelan hatiye avakirin, Tirkiye bi ti awayî naxwaze di navbera van gelan de yekitî û peyman hebe. Ji ber tirsa xwe û siyaseta wan ya şovenîst û sîstema wan ya navendî, hewldanên wê yên ji bo domandina dagşrkeriyê li herêmê û sûdgirtina ji şert û rewşa siyasî ya cîhanê, dixwaze projeya Mîsaqa Millî jinûve vegerîne. Li ser vî bingehî dagîrkerî û siyaseta guhertina demografîk pêş dixe. Niha jî heta asteke mezin hewl dide, li ser hebûna herêmê û gelên me bazirganiyê bike.

Helbet projeyên Tirkiyê li ser bakur û rojhilatê Sûriyê sînordar namînin. Ev proje, ji Sûriyê û Iraqê jî wêdetir, cîhanî ye. Weke hûn dizanin raya giştî ya cîhanî ya fermî û ne fermî dijberiya vê projeya Tirkiyê dike. Bêguman, ji bo têkbirina aramiya bakur û rojhilatê Sûriyê dewleta tirkî ya faşîst dixwaze çeteyên DAIŞ'ê zîndî bike û tola van çeteyan ji gelê herêmê hilde. Ev jî nîşaneke zelal e ku êdî gelek welatên cîhanê ji Tirkiyê û siyaseta wê ne razî bin. Lewra DAIŞ ji bo gelê cîhanê giştî xeter e.

**Bajarê Tel Rifat û Minbicê dibin armanca gefên wê, bi dîtina we ev bajar tenê hedef in?**

Divê em baş zanibin ku Tirkiye tinê herêmekê an jî bajarekî diyar naxwaze, dixwaze tevayiya herêmê dagîr bike. Niha giraniyê dide Til Rifrt û Minbicê. Jixwe ji hin mercan sûdê digire û dixwaze dagîrkeriya xwe berfireh bike û erdnîngariyeke firehtir bide çeteyan. Dixwaze bi vî awayî qadê veguherîne karteke mezin ya zextê û ji bo polîtîkayên xwe yên li herêmê. Lê divê em baş bizanin ku dagîkirina her bajarekî ji aliyê Tirkiyê ve tê wateya amanckirina tevayiya Sûriyê. Bi giştî divê em piştrast bin ku Tirkiye li ser hinek sînoran ranaweste.

**Hûn helwesta Amerîka, Rûsya û hikûmeta Şamê ya li hemberî van gefan çawa dinirxînin? Gelek bazarên siyasî hene? Eger êrîşeke nû ya Tirkiyê çêbe wê Sûriye ber bi kû ve biçe?**

Vê carê rewşa siyasî û têgihiştinên Navneteweyî ne di berjewendiya Tirkiyê de ne û Tirkiye di nava krîzên mezin de ye. Lê di dawiyê de ev dewlet, li Sûriyê xwedî berjewendî û ajandeyên taybet in. Tirkiye bi tevayiya derfetên xwe hewl dide hin peymanan pêk bîne. Divê tevayiya dewletên bibandor ji peyamnên bi Tirkiyê re dûr bikevin û rê nedin ku êrişeke nû pêk bîne. Lewra ku tişteke wisa bibe wê felaketan bi ser Sûriyê de bîne. Helwesta Şamê Helwesteke erênî ye. Lê divê ev helwest li ser bingehekî lihevkirina di navbera gelên herêmê de û misogerkirina mafên wan pêş bikeve.

**Di vê heyamê de Rêveberiya Xweser di warê siyasî û dîplomatîk de çawa tev digere?**

Bêguman, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û tevayiya saziyên wê ji aliyê dîplomasî û siyasî ve, di hişyariyeke giştî de ne. Dixwazin tevayiya sazî û welatên pêwendîdar bixin nava wêneya rewşê. Herwiha bi awayekî berfireh xeterên dagîrkeriya Tirkiyê û encamên neynî yên êriş û siyaseta Tirkiyê yên li ser vê herêmê pêk tîne, ji cîhanê re reva bikin. Gelek aliyên fermî dibêjin ku êrişa Tirkiyê wê xeterên mezin li ser yekîtiya erdê Sûriyê bike. Herwisa wê bandorê li nasnameya xelkê van deveran bike û wê DAIŞ xwe ji nû ve bi rêxistin bike. Bi giştî girîngiya vê mijarê ji aliyê civaka navneteweyî ve heye.

**Di civîna siyasî ya di navbera MSD'ê û Rêveberiya Xweser de helwesta berxwedanê hebû, li ser vî bingehî peyama we ji bo gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê çi ye?**

Bêguman Tevayiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê wê li dijî van projeyên Tirkiyê li ber xwe bidin û emê jî di Rêveberiya Xweser de, nûneriya vîna van gelan bikin. Emê tevayiya derfetên xwe ji bo şkandina vê êrîşê bi kar bînin û li hemberî hewldanên dagîkirina herêmê wê berxwedaneke mezin hebe. Hêzên Sûriyeya Demokratîk, Rêveberiya Xweser û tevayiya saziyên bakur û rojhilatê Sûriyê her tim wê mafê xweparastinê bi kar bînin. Herwiha wê avakirina civakeke azad û azadkirina herêmên dagîkirî wê xebat û armanca me ya sereke be. Ji bo xurtkirina pirojeya Biratiya Gelan û nêzîkatî li ser bingehê felsefeya Neteweya Demokratîk wê têkoşîn bidome. Wê garantîkirina avakirina paşrojeke demokratîk ya rast li herêmê, rizgarkirina tevayiya herêmên dagîrkirî û rêgirtina li pêşxistina pirojeya parçekirina Sûriyê, bingehê têkoşîna me be. Herwiha di vê qonaxê de divê em bi hev re li dijî Tirkiyê û projeyên wê bisekinin. Encamên pêşrojyên wiha, wê li herêma bakur û rojhilatê Sûriyê tenê nemîne, armanca wê tevahiya Sûriyê ye. Ji ber vê yekê divê tevyiya hêzên siyasî, demokrat û niştimanperwer li Sûriyê ku dixwazin aramiyê li Sûriyê bi dest bixin û dadmendî û demokrasiyê pêk bînin, ji bo ragihandina helwestên xwe ji bo parastina yekîtiya Sûriyê ya niştimanî û cografî bixebitin.

# Sorxwîn Avesta: Emê rojekê tenê jî rehet ranezin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Ji fermandarên Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Savaş Maraş ya Cenga Xabûrê Sorxwîn Avesta got, ev şer sed salî jî dewam bike, heta ku welatê me azad nebe, heta ku ev faşîzm ji Kurdistanê neyê qewirandin, emê nesekinin. Emê rojekê tene jî bi rehetî ranezin û wê Zap ji bo dewlata faşîst bibe goristan.**

Ji fermandarên Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Savaş Maraş ya Cenga Xabûrê Sorxwîn Avesta li ser şerê gerîla yê li dijî dagîrkeriyê ji Stêrk TV re axivî.

**'Li hemberî gerîla ti wateya teknîka wan nemaye'**

Sorxwîn Avesta diyar kir ku di mejiyê gerîlayên Kurdistanê de fikarek nîne; gelekî zelal û şênber e û wiha domand: "Bi bawerî, îrade û biryardariya xwe ya li ser serketinê, wê li ber faşîzm û dagirkeriya dewleta Tirk rabe. Ev şer sed salî jî dewam bike, heta ku welatê me azad bibe, heta ku ev faşîzm ji Kurdistanê bê qewirandin em ê nesekinin."

Avesta ragihand ku hêviya artêşa Tirk teknîka wê ye û got, Ti wateya vê teknîkê jî êdî li hemberî gerîla nemaye. Em gerîla hem di şer de ne hem jî di nava şer de di pêvajoya jinûve avakirinê de ne.

**'Me dewleta tirkî ya faşîst li Zapê kilit kiriye'**

Sorxwîn Avesta bi bîr xist ku artêşa Tirk a dagirker navekî gelekî balkêş li êrişa xwe kirine û got, "Navê 'Pençe-Kilît' lê kirine. Dema ku me ev nav bihîst em li herêma şer bûn, me dişopand. Li gel komek ji hevalan me liv û tevgera wan dişopand. Wê demê me got, 'Rast e, navê Pençe-Kilît li operasyonê kirine, lê belê em ê wan li Zapê kilît bikin. Gelo wê karibin kilîtê vekin û ji Zapê derkevin an na? Rewşa ku niha tê de ne bi vî rengî ye, me ew li Zapê kilît kirine."

Fermandar Sorxwîn Avesta destnîşan kir ku asta berxwedanê wê bilindtir bibe û wiha dewam kir: "Ev şerê li herêma Zapê wê êdî encamê biafirîne. Wê biqedin. Leşkerên Tirk wê welê bişikên ku êdî careke din berê xwe nede Zapê. Heval hemû xwedî vê biryardariyê ne. Em ê nehêlin ku derkevin. Em wan welê asê bikin, her roj êriş bikin û nehêlin ku rojekê jî bêhn bê ber wan. Wê rojekê jî bi rehetî ranezên."

**'Her endamekê YJA Star parêzvaneke doza kurd e'**



Sorxwîn Avesta işaret bi pêşengiya gerîlayên YJA Starê kir û got, Bi pêşengiya YJA Starê bi çalakiyan di cih de bersiv ji êrişa dagirkeriyê re hate dayin ku 17'ê Nîsanê destpê kir. Her endameke YJA Starê xwe kiriye parêzvaneke xurt a Kurd. Her endameke YJA Starê parêzvaneke gelekî xurt e. Mîna Baz'an lê didin. Ji bilî jiyaneke azad rêyeke din li ber nîne. Em li ser vê îqna bûne. Planên ku li ser gerîlayên Kurdistanê kirine, wê bi pêşengiya YJA Starê bêne têkbirin; Pençe-Kilît wê bi rastî jî li ser wan kilît bibe. Dagirkeriya Tirk wê têk biçe. Kurdistan wê li wan bibe goristan."

Fermandar Sorxwîn Avesta herî dawî got, "Em bi zor û zehmetiyan zanin û bi vê têgihiştinê tevdigerin. Di şerê dawî yê li Zapê de wê poşman bibin."



# Rojnamevan: Emê pênûs û kamerayên hevalên xwe li erdê nehêlin

Rojnamevanan bertek nîşanî girtina 16 hevpîşeyên xwe dan û gotin em/ pênûs û kamerayên hevpîşeyên xwe li erdê nehêlin.

Di çarçoveya lêpirsîna Serdozgeriya Komarê ya Amedê de di 8'ê Hezîranê de 20 jê rojnameger bi giştî 22 kes hatibûn binçavkirin. Piştî 8 rojên di binçavan de her 22 kes sewqî edliyeyê hatibûn kirin û ji wan Hevserokê Komeleya Rojnamevanan a Dîcle Firatê (DFG) Serdar Altan, Midûra JINNEWS'ê Safiye Alagaş, Edîtorê MA'yê Azîz Oruç, Midûrê Karên Nivîsan ê Xwebûnê Mehmet Alî Ertaş, rojnamevan Zeynel Abîdîn Bûlût, Omer Çelîk, Mazlum Dogan Guler, Îbrahîm Koyuncu, Neşe Toprak, Elîf Ungur, Abdurrahman Oncu, Sûat Doguhan, Remziye Temel, Ramazan Gecîken, Lezgîn Akdenîz û Mehmet Şahîn ji hêla Dadgeha Ceza ya Sulhê ya Nobedar a Amedê ve hatibûn girtin. Rojnameger Esmer Tunç, Mehmet Yalçin, Kadîr Bayram, Gulşen Koçuk û welatî Feynaz Koçuk û Îhsan Ergulen jî bi şertê kontrola edlî hatibûn berdan.

**Bertekên li dijî girtina rojnamevanan didomin.**


Rojnamevan Aysel Işik anî ziman ku çapemeniya azad di her şert û mercan de li ber xwe dide û her tim li pey heqîqetê ye. Işik, bi bîr xist ku rojnamevanên çapameniya azad di salên 90'an de dihatin qetilkirin û got: "Di 2011'an de jî qaşo di lêpirsîneke KCK'ê de gelek hevalên me hatin binçavkirin û girtin. Niha jî dîsa gelek hevalên me hatin girtin. Ji ber ku çapameniya azad rastiyên ku desthilatdar vedişerê derdixe holê hevalên me hatin girtin. Destdanîn ser amûrên me yên rojnamevaniyê, weşanxaneyên me desteser kirin, lê disa jî hevalên me di her şert û mercan de rojnamevaniya xwe didomînin."

Işik destnîşan kir ku heke sûcek hebe divê li nav desthilatê li vî sûcê bê gerandin û got: "Em bang li her kesî dikin ku xwedî li çapameniya azad derkeve. Îro hemû civak di bin tecrîde de ye. Tirs jî heta derekê ye, em îro dengê xwe bilind nekin û ji bo armancekê neyên cem hev, sibê wê pir dereng be. Ji ber wê em dibêjin ku bila hemû hezên demokratîk û civak li hemberî vê bêhiqûqîyê bibin yek û deng derxin."

**'Li ber xwe da wê li ber xwe bide'**

Rojnamevan Roza Metîna jî dîyar kir ku êrişên li dijî çapameniya azad ji dîrokê heta niha berdewam in û têkildarî mijarê ev tişt anîn zimên: "Têkoşîna ku çapameniya azad dide jî têkoşînek kevnar e, ji ber wê jî rojnamegerên kurd hem bi daxuyanî û çalakîyan hem jî bi rojnamegeriya xwe bi awayekî aşkera peyamên xwe li dijî wan êrişan didin. Dema li edliyeyê biryara girtina rojnamegeran hat dayin jî hempişeyên wan li ber derî heta sibê sekinîn û dema ew derxistin jî bi dirûşmeya, 'Berxwedan jiyan e' û hûn nikarin çapemeniya azad bêdeng bikin' bersiv dan."

Metîna di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku rojnamevanên jin li qadan bi berdewamkirina karê xwe peyama "hûn nikarin civakê bêdeng bikin" didin û wiha domand: "Bi van êrişan dixwazin ser qeyrana aborî û siyasî ku li Tirkiyeyê diqewime û qirêjiyên ku tên kirin binixumînin. Lê çapameniya azad ji dîroke heta niha li ber xwe dide, wê niha jî li ber xwe bide ji bo civak ji mafê ragihandine bêpar nemîne."




**'Xwedî li penûsa wan derkevin'**

Metîna di dawiya axaftina xwe de bang kir ku her kes xwedî li rojnamevanan derkeve û got: "Hem em hevpîşeyên rojnamegerên hatine girtin hem jî civak divê xwedî li rojnamegerên ku hatine girtin û rojnamegeriyê derkeve. Ji ber ku rojnamegerî di heman demê de rastiya civakê ye. Divê em civak tu car pênûsa rojnamegeran li êrde nehêlin. Îro armanca pergala yekperest ew e ku penûsa çapameniya azad li erde bihêle. Ji ber wê divê him em hem jî civak xwedî li pênûsa rojnamegeran derkevin."

**'Bêdengkirina çapameniya azad bêdengkirina civakê ye'**

Rêveberê DFG'ê Fexredîn Kiliç jî ji bo xwedîderketina li rojnamevanan jî bang kir û got: "Divê her kes xwedî li hevalên me yên ku hatine binçavkirin derkevin. Ji ber ku ev girtin ne ji rezê ye. Bêdengkirina çapameniya azad bêdengkirina civakê, bêdengkirina saziyên sivîl ên civakî û partiyên siyasî ye. Ji bo ku denge wan û civaka me neye birîn divê xwedî li hevalên me derkevin."

**'Pênûsa wan wê her binivîse'**

Rojnamevan Fûat Yaşar jî bal kişand ser pirsên ku ji rojnamevanan hatine pirsîn û got: "Ji wan pirsan jî xuya ye ku rojnamegerî tê darizandin. Ji ber ku li ser rojnamegeriya wan pirs pirsî ne. Armanca desthilata AKP-MHP ew e ku rojnamegeran bênefes bihêle. Demeke dirêj e van polîtikayan dimeşîne. Herî dawî jî hevalên me hatin girtin. Desthilata AKP'ê ji xwe re medyaya hawizê ava kir, rojnamegerên ku dixe nav hawiz cuda nêz dibin, yên ku nakevin nava hawizê wê jî figire û binçav dike. Lê ev zext ne nû ne. Berî desthilata AKP jî her tim li ser çapameniya azad zext û tundî dihatin meşandin, lê tu carî jî negihîştin armanca xwe. Sazî hatin girtin jî, lê bi awayekî xwe gihandin gel. Dê bi van girtinên dawî jî dê negihên armanca xwe û dê rastî bigihîjin gel. Ew şagirtên Apê Mûsa ne. Çawa dema apê Mûsa hat qetilkirin şagirtê wî heqîqet di tariyê de nehiştin û nivisîn, niha jî pênûsa hevalên me yên ku hatine girtin wê binivîse. Yanî hevalên rojnameger dê rojnamegeriya yên hatine girtin bidomînin. Rojnamegerên çapameniya azad di nav şert û mercen dijwar de jî wê rastiye bigihînin gel."

**'Ji bo xwe piştgiriyê bidin'**

Yaşar diyar kir ku di demên wisa de ya herî girîng piştgirî ye û ji bo vê bang kir: "Divê saziyên çapameniyê, yên sivîl, partiyên siyasî piştgiriyê bidin rojnamegeran. Dema em li nûçeyên hevalên me yên ku hatine girtin dinêrin, mikrofona xwe dirêjî ber kedkaran kirine, hunermendan kirine, xwendekaran kirine, jinan kirine, ji ber we jî divê hemû civak xwedî li wan derkeve û piştgiriyê bide hevalên me. Ew êrişên qesdî bi qasî li ser rojnamevan be ew qasî jî li ser mafê nûçewergirtinê yê civakê ye jî. Ji ber ku hevalên me nûçeyên kesên ku dewletê cih nedida wan jî çêdikirin. Ji bo ku dengê wan jî nayê qutkirin divê xwedî li rojnamegerên ku hatine girtin derkevin."

**'Helwesta çapamenıya muxalif ne helwesta rojnamegeriyê ye'**

Rojnamevan Hamza Gunduz jî bi lêv kir ku ew wek Otekîlerin Gundemî vê yekê şermezar dikin û got: "22 hevalên me hatin binçavkirin û piştî 8 rojan îfadeya wan hat girtin. Ji 22 kesan 16 hevalên me hatin girtin. Lê mixabin me ne li ber edliyeyê ne jî di vê pevajoyê de piştgiriyeke xurt nedît. Ji STK'yan bigirin heta saziyên din. Tenê li ser medyaya sanal bertek hatin nîşandan. Komeleya rojnamegeran û çapameniya ku ji xwe re dibêje muxalîf jî di nav helwestek wisa de bû. Em ji vê helwestê re nikarin bejên helwesta rojnamegeriyê. Ji ber ku berî her tiştî divê rojnameger li hemberî bêhiqûqîyê piştgiriye bide hevpişeyên xwe. Çi bibe jî em çapameniya azad em ê rojnamegeriya xwe bidomînin. Kî rastî bêhiqûqiyê were em ê piştgiriya wan bikin."

**'Çapameniya azad ne tenê ye'**

Gunduz di dawiyê de diyar kir ku çapameniya azad ji ber rastiyan hedef tê girtin û ji bo piştgiriyê bang kir: "Ji ber ku çapameniya azad di kolanan de bi kurdî hevpeyvînan çêdike hedef tê girtin. Heke nûçeyên çapameniya azad sûc bin, em jî hevkarê vî sûcî ne. Em ji bo piştgiriyê bang li hemû kesî dikin. Çapameniya azad tenê nîn e û bedêng namîne."

*MA*



## PKK û Ewropa

**Faruk Sakik**

Di 12'ê Îlona sala 1980'yan de li Tirkiyê darbeya leşkerî çêbû. Ji ber zilma 12'ê Îlonê gelek rêxistinan berê xwe da Ewropa. Di demeke wisa de PKK'ê di mayîna li çiyayên Kurdistanê û Rojhilata Navî de israr kir. Rêber Apo di parêznameya xwe ya pirtûka 5'an de bersiveke wiha dide çima Rojhilata Navî? "Me rolek wek taktîk da Ewropa. Ev biryareke rast û di cî de bû. Gelek rêxistinên Tirkiyê berê xwe dan Ewropa, li wê derê bi tasfiyebûnê re rûbirû man. Bi taybetî DEV-YOL eger xwe biparasta, dikaribû îro li Tirkiyê bibe hêzeke mezin. Di wê demê de DEV-YOL ji PKK'ê bihêztir bû. Lê li Ewropa xwe tasfîye kir." Lê piştî demekê, li Kurdistanê hovîtiya dewleta Tirkan derket asta herî jor, Kurdan berê xwe da koç û koçberiyê. Hatin li Ewropa bi cî bûn. Bi giranî Kurdan Almanya tercîh kir. Dema Kurd hatin Ewropa PKK ji bo ku ev girseya hatî, di nava jiyana Ewropa de nehele, dest bi rêxistinkirinê kir. Ne bi di warê siyasî tenê de, ji bo parastina ziman û çanda kurdî jî têkoşîneke taybet da meşandin. Ev Kurdên di wan salan de hatibûn Ewropa jî êdî hêdî hêdî li dora PKK'ê diciviyan. Rêxistinbûna PKK'ê ya li Almanya bala dewleta Tirkam jî kişandibû û ji rayedarên Almanya ji bo midaxlekirinê ketibûn nava hewldanan. Di rastiyê de qedexeya li ser PKK'ê ya li Ewropa weke encameke kiryarên Gladyo û NATO derket holê. Ev jî digihîje kuştina Olof Palme. Serokwezîrê Swêdê Olof Palme di 2'8ê Sibata 1986'an de hat kuştin. Şefê serwîsa îstîxbaratê ya Swêdê Hans Holmer, weke berpirsyarê vê sûîqastê PKK nîşan da. Di du salên piştî vê bûyerê de bi taybetî li Almanya êrîşên li dijî siyasetmedarên Kurd dest pê kirin. Di vê çarçoveyê de nêzî 20 welatparêz û şoreşgerên ku di nava wan de ji Pêşengên Têkoşîna Azadiyê Alî Haydar Kaytan û Dûran Kalkan jî hebûn hatin girtin. Dewleta Alman di 23'yê Mijdara 1993'yan de biryara qedexekirina PKKê eşkere kir. Piştî Komploya Navneteweyî Amerîka bi tenê 2 salan sebir kir. Êrîşa 11'ê Îlona 2001'an di siyaseta Amerîka de hin guhertinên mezin çêkirin. Ji bo li hemû cîhanê hukm bikin ev êrîşa 11'ê Îlonê kir hincet û hin lîsteyên nû yên "terorê" çêkirin. Hin dijminên nû destnîşan kirin. Di demeke wisa de dixwest ku li Rojhilata Navî jî bi cî bibe. Lê ew PKK ya xwestibû bi kompoloyê tasfiye bike hê jî li heremê hukum dikir. Paradîgmaya Ocalan li her deverê belav dibû. Ji bo pêşîgirtina li vê rewşê di lîsteya xwe ya terorê de, navê PKKê jî bi cî kir. Sal derbas bûn piştî Amerîka, Yekîtiya Ewropayê jî di 10'ê Sibata 2014'an de PKK'ê xist lîsteya "terorê". Yekîtiya Ewropa bi daxwaziya Tirkiyê PKK xistibû lîstê. Di 1'ê Gulana 2014'an de rêveberên PKKê Murat Karayilan û Duran Kalkan bi navbeynkariya parêzeran serî li Dîwana Edaletê ya Ewropa dan û îtiraz kirin. Dîwana Edaleta ya Ewropa di 15'ê Mijdara 2018'an de têkildarî tevgera azadiya Kurdistanê biryareke ku encamên muhîm yên hiqûqû, siyasî tê de hene girtin. Dadgehê biryara ku di 2014'an de ji hêla Yekîtiya Ewropa ve derheqê Partiya Karkerên Kurdistanê-PKK'ê de hatibû girtin û PKK'ê xistibûn lîsteya "terorê "di cî de nedît. Lê çavê her kesî li doza Belçîka bû. Herî dawî Dadgeha Îstînafê di 8'ê Adara 2019'an de biryar da. Dadgehê diyar kiribû ku "PKK ne rêxistineke terrorist e, hêzeke çekdar ya ne dewlet e'. Li ser vê yekê di 28'ê Çileyê de rûniştina dozê li Dadgeha Bilind ya Belçîkayê pêk hat. Dadgeha Bilind ya Belçîkayê jî biryara xwe ya dawî eşkere kir. Dadgehê biryara dadgeha Îstînafê erê kir. Lê li hemberî van biryarên van dadgehan jî dewletên Ewropa di israra xwe de bi biryar in. Kurd jî bi biryar in ku tevgera azadiya Kurdistanê ji wê lîsta reş derxin.